Pirozbayî bi hatinaSersala î1985.
Sala 1984 vaye koca xwe bar dike^ûSala1985liwarê wê Datine.Sal bi sal evaya Serustiya pêsveoûna Ϙanûma.Jînêye.
Ev sala han dewlemendbû bi Bûyînên xwe li seraserî cihanê û he r wehajî di nava Kurdistana me de,Kurdistan hejar û birindar,lêbelê xebatvan.
Nobûn û harbûna Impiryalizmê,bi Serokitiya Impiryalizma Emerîkî beramberî tevaya Mirovanyê bi xistinaAsityê li seraserî Cîhanê ber metirsiya serekî Hesteyî,ku têde tevaya Mirovan li ser rûwê Zemînê tête qirkirkirin.
Xebata Miletê Kurdî percekirî li seraserî Kurdistanê bêtir û bêtir Cihekî wîyî Taybetî di xebata Miletên Rojhilata Navîn de cêdibe,jiber hêjî Pirsiyariya wîyî Welatî bi herdû milên xwe ve,a milî û a Civakî ,nehatiye carekirin.
Evaya bi xwejî pêwist dike ,na hêjiî bêtir necar dike bi hinera pêsvecûna Qanûna Jînê Viyetnamkirina Kurdistan di Rojhilata Navîn de.Kurdistana meyî Sêrin,rind û Ciwan bi saya Karker û Cotkarên Kurdistan dibe dilê Sûresê li Rojhilata navîn dijî Impiryalizmê,Serdariya Bêganê û hilanînaBehrkisandina Mirov di rêya Mirov de li tevaya Rojhilata navîn a me.
Pêsmergên Kurdistana Iraqê lêdanên mezin li rêjima Basiyî Afleqiyî Tekritiyî xwîxwar didin,pê serê Hêzên Demokrat û Pêsverû li seraserî Iraqê berzdikin.
Hêmî rêjima Diktatoriyî Fasî ji rehan de dilerizinin,rûxandina wê amade dikin.
Bi saya Berê Demokratiyî Welatî ,ku roj bi roj firehtir û dinava Cemawerên Iraqê de qûltir dibe rojeke bi hêvî ji bona Gelê Iraqê bi Ereb,Kurd û Kêmaniy. Milî ve diyar dike bi Demokratî ji bona Uraqê û Ewtonomiyek rast û durust ji bona Kurdistanû Rêjimeke Demokrasiyê ligelhev.
Hêrandina lasên Mirovan di Cenga Qadisya Sedamêxwînxwart tîne dawîkirin.Asityê û Dostanyê dinava Miletên Iraq û Iranê de berz û bala dikin.
Li Kurdistana Iranê Miletê Kurd hêjî daxwaza Xwedmuxtariya xwe dike,jêre xebatê dike.
Lisuryê Kurd xebatê dikin ji bona Mefeyê xwe yî Milî û hilanina wan qanûnên n wa ku hêjî li ser serê wî tên bi cihanin,Ew li gel hemû hêzên pêsverû û Wela perwer xebatê dijî Impiryalizme,Sehyonozmê û Kevneperestyê dikin .
Care Pêsiye di M^juwa Kurdistan me de xebata Miletê me cihekî Mêjûyî li ji bona bi serketinê û gihandina Serxwebûnê nîsan dike.Mujde û mizgîn dike. Kurdistan Bakur(Kurdistana Turkyê)di sala 1984 de ve belê rastiya xwes û ges di xeb t Gelê Kurdistanê de mêjû dike.Xebata Miletê me di vî Percê Kurdistanê de,di îvê salaMêjû de di bin Rêberiya Karker û Cotkar de li ser rêca Markizin,lêninizim,cîhnbîna Ciniya karker ji bona serxwebûnê,xwesbûna Jînê û hilanina Behrkisandina Mirov di rêya Mirov de ji nava Civaka me hîmê tevayaToranizim û Generalên Fasitên Turkîyê li Kurdistana ji rehan de kisandin hejandin.Lerzîneke xistiye nava erkê wan bi xwêna bi hezaran ji Qehreman Karker û cotkar Kurdistan.Reskê Kurdîstan,Reskê Ciya Karker û Cotkarên Laweñ Sêx Seîd,Ixtî û Fuad li ser ciyayên Ararat li ber cav^n Xwîn xwarên Toranizimê berz û bal dibin.Cend xwese ev mujde û Mizgîna han,bele Rêberiya Karker Cotakar evyaye Bextê Kurdistan,h^jî bêtir Mirovanya Miletên Kurd wî bi xweye.
Miletê Kurd mîna hemû/dunyayê xebatê ji bona asityê dostanyê pistgirtinê dike ji tev aya Mirovan yê bi xwesî û bextiyarî li vê gêtuiya me bijin,bes biminîn ceng û ser,tev bi xwesî û dilsadî bixun dewlemendbûna kar ûhatinên serûstiyê mîna hev,belê da Mirov bibe mirov ê di dunyê de.

Em bi nava Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa hêviya yekitiya tevaya xebata Xwendevanên Kurd li Ewopa daxwazdikin,ji ber di yekitiya me de encamê Karê me diyardibe.Herweha em sersaleke nuh ji tevaya Xwedevanên xwe re bi serketin û tendurûstiyê hêvidikin.Ji Miletê Kurd û jitevaya Miletan re Bextiyariyê Asityê û xwesbûna Jînê dawxazdikin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa (K S S E)
- Rêberiya Gistî- I.I.1985de

# KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)

KSSE C/O Asad
P.F. 301 503
1000 Berlin 30

Pîrozbayî bi hatina Sersala 1985.

Sala 1984 vaye koça xwe bar dike û Sala 1985 li warê wê datîne. Ev sala han dewlemend bû, bi Bûyînên xwe li seranserîn cîhanê û her wehajî di nava Kurdistana me de, Kurdistana hejar û birîndar, lêbelê xebatvan.

Nobûn û harbûna Impiryalizmê, bi seroketiya Impiryalizma Emerîkî beramberî tevaya Mirovanyê bi xistina Aşityê li seranserî Cîhanê ber metirsiya şerekî Hesteyî, ku têde tevaya Mirovan li ser rûwê Zemînê tête qirkirin.

Xebata Miletê Kurdî perçekirî li seranserî Kurdistanê bêtir û bêtir Cihekî wîyî taybetî di xebata Miletên Rojhilata Navîn de çêdibe, jiber hêjî Pirsiyariya wîyî Welatî bi herdû milên xwe ve,a milî û a Civakî , nehatiye çarekirin. Evaya bi xwejî pêwist dike Viyetnamkirina Kurdistan di Rojhilata Navîn de. Kurdistana meyî Şerîn bi saya Karker û Cotkarên Kurdistan dibe dilê Şoreşê dijî Impiryalizmê,Serdariya Bêgane û hilanîna Behrkişandina Mirov di rêya Mirov de li tevaya Rojhilata navîna me.

Pêşmergên Kurdistana Iraqê lêdanên mezin li Rejîma Basiyî xwînxwar didin, hîmê Rejîma Diktatoriyî Faşî ji rehan de dilerizînin, rûxandina wê amade dikin. Bi saya Berê Demokratiyî Welatî, ku roj bi roj firehtir û dinava Cemawerên Iraqê de gûltir dibe rojeke bi hêvî ji bona Gelê Iraqê bi Ereb, Kurd û Kêmaniyê Milî ve diyar dike bi Demokratî bona Iraqê û Ewtonomiyek rast û durust ji bona Kurdistan, hêrandina laşên Mirovan di agê Cenga Qadisya Sedamê xwînmij de tîne dawîkirin.

Li Kurdistana Iranê Miletê Kurd hêjî daxwaza Xwedmuxtariya xwe dike, jêre xebatê dike.

Li Sûryê Kurd xebatê dikin ji bona mafê xwe yê milî û hilanîna wan qanûnên nerewa ku hêjî li ser serê wî tên bi cihanîn. Ew li gel hemû hêzên pêşverû û welatperwer xebatê dijî Impiryalizmê,Sehyonizmê û Kevneperestyê dikin.

Cara pêşiye di Mêjuwa Kurdistan de xebata Miletê me cihekî Mêjûyî ji bona bi serketin û gihandina Serxwebûnê nîşan dike belê mujde û mizgîn dike. Li Kurdistana Bakur ( Kurdistana Turkyê ) di sala 1984 de vê rastiya xweş û geş di xebata Gelê Kurdistanê de mêjû dike. Xebata Miletê me di vî Perçê Kurdistanê de, di vê sala Mêjûyî de di bin Rêberiya Karger û Cotkar de li ser rêça Markisîzim-Lênînîzim cîhanbîna Çîniya Karger ji bona serxwebûnê,xweşbûna jînê û hilanîna Behirkişandina Mirov di rêya Mirov de ji nava Civaka me hîmê tevaya Toranizim û Generalên faşistên Turkîyê li Kurdistanê ji rehan de kişandin,hejandin. Lerzînek xistiye nava cergê wan. Reşkê Kurdistan, Reşkê Çiya,Karger û Cotkar, lawên Şêx Seîd, Ixtî û Fuad li ser çiyayên Ararat li ber çavên Xwînxwarên Toranî berz û bala dibin. Çend xweşe ev mujde û Mizgîna han. Belê Rêberiya Karger û Cotkar evaya bextê Kurdistan, hêjî bêtir Mirovaniya Kurd bi xweye.

Miletê Kurd mîna hemû Miletên dunyayê xebatê ji bona Aşityê, dostanyê piştgirtinê dike da tevaya Mirovanyê bi xweşî û bextiyarî li vê gêtiya me bijîn û bes bimînin ceng û şer.

Em bi navê Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa -KSSE-hêviya yekitiya tevaya xebata Xwendevanên Kurd li Ewropa daxwazdikin, ji ber di yekitiya me de encamê karê me bi başî diyardibe. Herweha em sersaleke nuh ji tevaya Xwendevanên xwe re bi serketin û tendurustiyê hêvîdikin; ji Miletê Kurd û ji tevaya Miletan re Bextiyaryê,Aşityê û xweşbûna Jînê daxwazdikin.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa ( K S S E )
-Komîta Rêberiya Giştî -

I.I.1985